

# GOVEND

Kovara Çandi û Huneri / Kültürel ve Sanatsal Dergi

Yıl:1 Sayı: 5 Agustos - Eylül 1992 (İki Ayda Bir Yayınlanır) Fiyatı: 5000 TL. (KDV Dahil)



- ✓ LI SER HINEK CÛREYÊN LIHEVANÎNAN...
- ✓ LEYLA Û MECNÛN...
- ✓ A. SEVİNÇ'LE RÖPORTAJ...
- ✓ JI NAV EDEBİYATA KURDÎ: "Ş. ABDURAHMANÊ AXTEPÎ"...

# GOVEND

Kovara Çandi û Huneri / Kültürel ve Sanatsal Dergi

## SAHİBİ

Mazhar KARA

## SORUMLU YAZI İŞLERİ MÜDÜRÜ

Mükerrem AYYILDIZ

## YÖNETİM VE YAZIŞMA ADRESİ

Gevran Cad. Şair Sırrı Hanım  
Sok. Ustabası Apt. No:29  
Zemin Kat Daire:1  
OFİS / DİYARBAKIR  
TLF/ FAX:136 63

## BANKA HESAP NO:

Mazhar KARA Adına  
T.C. Ziraat Bankası D.Bakır  
Merkez Şubesi  
353764 Nolu cari Hesap

## ABONE KOŞULLARI

6 AYLIK : 15.000

1 YILLIK : 30.000

## İLAN TARİFESİ

Arka Kapak :750.000

iç Kapak :500.000

Tam Sayfa :300.000

Yarım Sayfa :150.000

1/4 Sayfa :75.000

## DIZGİ

## EZGİ PRODÜKSİYON

TLF:455 78 /D.BAKIR

## BASKI

Aydınlık Matbaacılık

## İÇİNDEKİLER / NAVEROK

Pêşgotin.....	1
Lı Ser Hinek Cûreyên Lihevaninan	
DILOVAN .....	2-3
Helbest	
BARAN/EZMAN .....	4
Jı Sala 1979 Hetani Sala 1983 Rewşa Kurdistanana Rojhilat (2)	
L.ÖZDEMİR .....	5-7
Leyla û Mecnûn	
K.RONAHI .....	8-10
Deranin	
B. ZINAR .....	11
A. SEVİNÇ'le Röpörtaj .....	12-15
Kelime û Bêjeyên Diji Hev	
VAZGAL .....	16-17
Kürt Ermeni Edebi İlişkileri (2)	
Kinyazê İBRAHİM .....	18-21
Rıkka Gukulahi	
N. RONA .....	22-24
Jı Nav Edebiyata Kurdi: " Şêx Abdurahmanê Axtêpi "	
F. ŞÊXANİ .....	25
Jı Nav Şanoyên Kurdi: "Xwestin"	
İbrahim Ehmed SIMO .....	26-27
Jı Nav Folklorê Gelê Me / Pekenî .....	28
Jı Bo Zarokan .....	29
Helbestên Xwendevanan .....	30
Nameyên Xwendevanan .....	31
Govend için	
BARAN .....	32-33

## ADRES DEĞİŞİKLİĞİ

Eski yerimizden, "Şair Sırrı Hanım Sok. Ustabası Apt.  
No:29/1 Ofis Diyarbakır." adresine taşındık.

# PÊŞGOTIN

*Xwendevanên delal,*

*Lı ser destpêka weşandina Kovara Govend, heşt meh derbaz bû. Ev dem li gor dirokê pır durêj nine. Lê gava meriv karê ku di vê demê da hatiye kırım dide ber çavan, dibine ku ev ne demeke kın e. Divê Kovara Govend, ne tenê bı xebat û lêkolina xwe ya çandî û huneri va bê ditin. Her weha ji, wi bı weşana xwe va cesaret da insanan ji bo xebat û hewldanê. Dikarin bêjin, weşanên ku li ser çand û hunera Kurdan derdikevin, ji wan gelek di bin tesira Govend da diminin. Ev yeka ji tıştek ne hundik e.*

*Lı aliye dın, divê xwendevan bı kêmasi û serfiraziyê va Govend qebûl bike.*

*Pırsa yekemin ev e, ku kesên li kovarê dixebitin, ne profesyonel in. Her usa di wi wari da xwediyan cerbandinên kûr nin in. Ji me tu kes berê ji di xebata weşanek da cih negrtı bûn. Em ne xwediye imkanên zêde bûn, ne ji xwediye arşiveke xûrt. Ji bo vê yekê ji, hûn ji dibinin, heta roja iro ji alî rızman, rênivis û tiprêziyê da gelek kêmasiyên me çêbûn. Lı ser van kêmasiyan, gelek xwendevanên me rexneyên dostani û granbuha ji me ra bı rêkırın. Em cehd dıkin, ku iro pê ve kêmasiyan ji holê rakın. Ji xwe me di seri da ji got: Bı alikariya xwendevanan em dikarin berhemên rınd bıdın. Tu afirandinek bê alikariya xwendevanan û gel nikare biji.*

*Xwendevanên hêja,*

*Em çawa kêmasiyan, xeletiyên dibinin û rexne li wan dıgırın, divê tıştên baş ji bibinin.*

*Beri her tışti Govend, gaveke nû û mêrxasi ye. Pıştê 12 İlonê, Lı Kurdistanê kovareke yekem e, ku di warê huner û çand da, bêtri bı Kurdi derdikeve. Her usa ew li Diyarbekır, di bin şertên dijwar da jiyana xwe berdewam dıke. Ev ji tışteki mezin e. Heta roja iro li Diyarbekır li ser çand û hunera Kurdi, xên ji Govendê tu kovarek nehatiye weşandın.*

*Hevalno,*

*Tıştên heri hêja ev e, ku Govend di mercên dijwar da bı xebateke hêja li ser axa Kurdistanê tê weşandın. Em astengiya xwe baş dızanın. Lê em bawer in, emê serkevin û ev serketin wê yê me hemûyan be.*

**GOVEND**

# LI SER HINEK CÛREYÊN LIHEVANÎNAN

---

---

## DILOVAN

Jiyana Kurda, jiyaneke bî dîlgermi, bî gote-got û henek, bî qir û gazi, xebat û lebat, bî kêf û şer e. Lewra ku Kurd lî cihanê bî mêvanperweri, camêri, dîlgermi û cengaweriya xwe têne naskirîn.

Kurd, dî rojên kêf û eşqan, dilan û govend û cejn û şadiyê de weki pêlê Fîratê din û har dîherike nava jiyane. Dî cengê da bî halanin, wek behra Wanê dî hundirê zîkê xwe da bî gir û hêrs in. Jî hezkiriyên xwe ra nefspîçûk, dîltenik û weki lîva berxa, nermik in. Mihriban in, dîlpak û bî rehman, bî dosta ra dost, dijminê dijmin in. Dîlvekîrî û wek hîva çarde sali zîz û paqj in. Carna, dîbîn reşşeki şîliya bîhara kemilî, dîbarîn lî ser ruyê gul û sosîn û rîhanê mîrgan; wek ava çaykaniyên çiyayên Kurdistanê kûr û zelal in. Lê lî hember dijmin, dijminê bêbext û xayîn wek şêr serbilînd, mîlzexm in. Lî meydana cengê bî heybet in. Xofa wan wek çiyayê Agîrî dîbe muj û dûman, bahoz û baran ku dîkeve dilê neyaran.

Lê ew jî rastiyeke ku gelê Kurd, pîri jiyana xwe dî şer û dawana da bûhartiye. Lewra, êrişên qolonyalîstan qet mecala sekanê nedaye wan.

Disa jî çîqas jî Kurdistan dî binê nîrê koledar û qolonyalîsta da be jî, ew dîzane jiyana xwe xweş û rînd bike. Dilan, govend û şaiyên Kurda bî nav û deng in, dilê keç û xortan wek pêlê Dîclê lî hev radîbîn û rûdînin û dîherîkî berbî jiyane nû. Dî dilanan da listîk û reqs dest pê dîke, kîlam û dilok û xeribî û cûre cûre gotî lî ser jiyana rojane tîn lî hevnanin, kîlam û mîqamê nû

tîn strandî.

Dî rojên dilan, govend û şaiyan da, alem, kêf û eşqê da ye. Lê dayika bûkan tenê kêf û şewatê dî dîle xwe da bî hev ra mezî dîke, bî hev ra dîji. Dîlê malbatên bûkê şa ye jî bo xînamîti, mîrovati û hevna-siyên nû. Lê lî aliyek dî jî dilê ku jî delaliya eşirê, keça wan a nûgiha dîqete bî şewat e. Şayi û şewatê bî hev ra mezî dîkin, dî dîlda...

Lê malbatên zavê her bî kêf û eşq û şa ne. Lê jî bo dilê diya bûkê bîşewitînî acqîciyan dîdîne. Rojek berya sîwarkîrîna bûkê şeva hîne çêdîbe. Dî wê şevê da keçên heval, ên bûkê lî dor wê kom dîbîn kîlam û lurik û xeribîyan dîbêjîn. Lê berbû xeribîyan wer lî hev tînin ku dilê diya bûkê agîr berdîdîne û dîşewitînî.

Hinek jî xeribîyên ku lî ser bûkan têne gotî, bî vi awayî ne;

Xaniyê bavo kort e  
Dîlopan şorte-şort e  
Bûkê megri, zava xort e.

Jî ber acqîciyan berbûya dilê bukê dîşewite û lî çavê dayika xwe ya bî hêsrî dînhêre. Jî bo hebek madê dayika xwe xweş bike, dengê xwe bilînd dîke û vê xeriba han dîbe;

Xeriba xwedê me  
Dara lî devê rê me  
Gotîne we jî we ra  
Hesreta mala bavê me.

Berbû lê vedîgerînin û dîbên;

Xeriba lı sukê  
Hıne kır neynûkê  
Par qız bû,  
İsal bûkê

Û dilê berbûya bı van têr nabe, xeriban  
lı dû hev dirêj dıkın û dibêjın. Jı bo dilê  
dayika bûkê bişewıtının çı bêji dıkın û  
çıqas zımanê wan vegere dibêjın.

Xeribê bırın bırın  
Heft gundan derbas kırın  
Dilê dayikê xırab kırın,  
Mala dayikê xırab kırın.

Heyani vıra rûyeki, peleki jı jiyana ro-  
jane a gelê Kurd e. Dı her rûpeleki da jıyan  
sıtraneke e, lı ba mırovê gelê Kurd.

Wexta bûk dest bı jiyana zewıcandi  
dike û dı ser deweta wi da çend sal û meh  
dıbihûre, delalitiya wi dışkê û xesi kilitá  
teşt û kulinê dıde destê wê, jiyana wê ya  
rojane tê guhertın.

Xesi wek serleşkerekera ferman dar çavê  
xwe jı bûkê naniqine û wê dı bin çav da  
dıgre. Dilê bûka jar ji jı xesiyê fıkar dıke û  
jı bo parastına xwe tım şıxûlê xwe bı kar  
tine. Lê kılana dew hınek cara şıxûl ber bı  
qıyame dıke. Wexta tırsa xesiyê dıkeve dilê  
bûkê, bûk lı ber serê sırsûmê (meşk) vê  
helbesta han lı hev tine;

Dew dıkılê m dew nabe  
Dew dı meşkê da belabe  
Wexta xesi ji xew rabe  
Gıjık lı seri lı ba be  
Halê mın bı halê se be.

Her bı vi awayi lihevanına lı hev rêz  
dıke û kilên meztır bı hışk va lédıxe. Lê  
dew, tu dibê qey xıstiye rıkê kebanıya nûh  
û dı kewna xwe da çênabe.

Bûk dıweste, birçi dıbe, xwarın dıkeve  
bıra wê, lê ji tırsa xesiyê nıkare serê sırsûm  
(Meşk) berde. Kebanıya nûh lı şer vê rewşa

xwe waha dibêje;

Dew dıkılê m lı eywanê  
Rûn hıldıdım fıncanê  
Dıde me bejê riji  
Xesiyê bê imanê

Kurd, ne tenê dı dilan û şayıyan da  
kılam û stran û lihevanınan çê dıkın û  
dibêjın. Her beşek jı jiyana Kurd stranek e,  
lihevanineke e û hozanek e. Jı ber vê yekê  
ye, ku ewqas dengbêjên kılam û mıqamê  
cımetê çê bûne. Ev yek dı çanda gelê Kurd  
da ciheki giring dıgre.

Çawa dı dilan, şın, şayi û şeran da, bı  
wi awayi ji dı nava jiyana rojane da van  
pırs, helbest û lihevanın têne gotın;

Eli yû Ebdileziz ın  
Du heb xortên temiz ın  
Ketne xewa xebız ın  
Gur dı nava pez da dılızın

Ev lihevanınê han jı nava jiyana rojane  
derketine. Dı vi lihevanına jor da; du heb  
xort lı ber şewına pez razane û pez dane  
gur. Lı ser vi bûyera han hozaneki gundi  
van lihevanına nivisandiye û weha dirêj  
kırıye;

Ez çûm mala Mele Eli  
Rûnişti bú weka weli  
Gote Asê lawo bazde geli  
Bızına hêşın bine, bıkıne qeli

Ez çûm mala Musa  
Çavê wi dı binê cılıkê da dıçılûsi  
Mın bı mıla girt rakır piya  
Cıxareki kır nava tılıya  
Mın go tu nexweşi çı yi  
Got nexweşê her çar miya.

Meriv dıkare lı ser vi mesela han hin  
geleki tıştan bıbêje. Lê emê bıhelın hejma-  
reki dın. ■

**DIRBAN****BARAN**

Carcaran lı Govê, Kanya Sipi me  
 Lı Kelemê Qerê, Pozi Gulan ım  
 Sawa û Kêsling, Dara Bayivê  
 Lı Tata Şilkê û serê Billan ım  
 Xırêbe û Dostel û Goma Lotê  
 Hopik û Dêdar wek xewn û xeyal ım  
 Perê mın lı der e  
 Koka mın lı wir e  
 Wek dara beriyê, yan gûzeke kevn  
 Lı welat ım, lı Dirban ım.

**GELO XWEŞ E SERXWEBÛN****EZMAN**

Xebatkarên Rojhilat  
 Rojê bavên ser welat  
 Welat xweş e bı xebat  
 Dıxwûm sonda azadi

Xebatkar ım roj bıdım  
 Avi bıdım, bej bıdım,  
 Lı ser welat aj bıdım  
 Dıxwûm sonda azadi

Xebatkar ım, dil bı geş,  
 Jı dılda çû xwina reş  
 Rojê davêm şeva reş  
 Dıxwûm sonda azadi

Gulistanê gul bıdım  
 Gul û kulilk av bıdım  
 Av bıdım, ber tav bıdım  
 Dıxwûm sonda azadi

Xebatkar ın ez û tu  
 Dest bıdın hev û dû  
 Roni bıde rojek nû  
 Dıxwûm sonda azadi

Xebatkarên Rojhilat  
 Me xwe daye, birç û lat,  
 Azadi tim bo welat  
 Dıxwûm sonda azadi

Ez Ezmanê histêrxwin  
 Kezeb reş ım, dil bı xwin  
 Gelo xweş e serxwebûn  
 Dıxwûm sonda azadi

# JI SALA 1979 HETANI SALA 1983 REWŞA KURDISTANA ROJHILAT (2)

## DAXŪYANI

*Dı hejmara borin de, sernwisa nwisara L. ÖZDEMİR bı xeleti "Jı Sala 1979 Hetani Sala 1983 Rewşa Kurdistanana Rojava" hatibû nwisandin. Rasti, "Jı Sala 1979 Hetani Sala 1983 Rewşa Kurdistanana Rojhilat" e. Ev xeleti ya nwisar bı xwe ye. Lê xeletiya me ji heye. Jı çav reviya.*

*Sedem vê yekê em dîrwazın xwendevan me biborin û bibexşin.*

## L. ÖZDEMİR

Dı vıra pêwîst e bê gotin ku nêziki 3000 pêşmergeyên PDK-I (Parti Demokrata Kurdistanana Iraq) û bı malbata wan ve jı sala 1970 vır da xwe spartibûn Kurdên Îranê û lı navça Mîrgewer-Tîrgewerê nişte bîbûn. Mesûd û Îdris ji lı Rajan jı xwe ra bînge dibûn. Kurdê Îranê dı wan salên çûyida gelek bı başi qedrê Kurdên Iraqê girtibûn. Partiya Demokrata Kurdistanana Îranê bı hemû karin û guncanên xwe ve yarmeti û alikariya Kurdên pênbirên Kurdistanana Iraqê dıkırin. Pêşmergeyên Kurdistanana Iraq bı çek û rextên xwe ve bı serbesti lı Kurdistanana Îranê dıgeriyan, hat û çû dıkırin. Lê tekılı kar û barê PDK-I nedibûyan. Jı xwe lı Kurdistanana Iraqê ji şerê partizani hebû. Ewana ji carcaran dıçûn eniya şer lı navçê Behdînan. Bı kurti bı karê xwe ve mijûl dibûn.

Ew navçê ku pêşmergeyên Kurdistanana Iraqê têda bûn, zêdetır dı bın hikariya Senarê Mamedî û Taharxan Axa de bûn. Taharxan Axa kurê Sımkoje. Hevkarê PDK-I nebû. Lê dijmin ji, nebû. Lê belê axayek xwedi eşir û êl bû. Her wiha çekdarbû. Tenê xwe û malbata xwe dıparast. Dewlet ji zû bı zû tekılı wi

nedibû. Senarê Mamedî, ew jı wexteki endamê komita nawendiya PDK-I bû. Xwedi eşir bû û gelek gundên hawidor dı bın bandûra wi de bûn. Senar alıgırê PDK-I bû. Lê mirovek bawerpêkiri û dilsoz nebû. Demek bı Gani Bîluryan û Mamoste Hêmin re, xwestin ku tevgrêdanek daynin ku weki liqeki Tudeh bixebite, lê Senar nıkari dı vi kari de ji serkeve. Pişti wexta ji, jı PDK-I qetiya û dı halê xwe da ma. Lı dora Senar çend pêşmerge ji ma bûn. Carcaran ewan û çekdarên PDK-I lı hev dıxıstın lê zû aş dibûn.

Tevgera azadixwaziya gelê Kurd lı Kurdistanana Iraq bı roj xwürttır dibû. Dı gel serkeftinê leşkeri dı warê cıvaki de ji, parti xebatek baş nişan dıda. Jı sedan heştê (80 %) Kurdên Kurdistanana rojhilat bı PDK-I bawer bû. Ewan qıma xwe bı seroktiya partiyê anibûn. Parti bı Komela (Komelayi Zehmetkêşani Kurdistanani Iraq) re ji dıxwest hevkarî bike. Lı wi beşê Kurdistan tenya du hêzên kurdewar hebûn; PDK-I û Komela. Komela piçûk bû xwe marksist dipejirand. Lê PDK-I her tım xwe demokrat dıdit. Dı nav Komela de gelek demokrat hebûn, her wiha dı nav PDK-I de ji, gelek marksist cih

girtibûn. Lê xet û bernama her dû hêzan, ji hev cûda bûn. PDK-î her niha ji lî Kurdistanana rojhilat dixebite. Komela ji bî sazûmanên Îrani ve yekitiyek pêk aniye û bî navê "Partiya Kominista Iran" jiyana xwe dajo. Lê lî Kurdistan ewqas hukma Komele tu ne ye. Dî nav pêşdeçûna vê nivîsarê de emê carcaran disan vegerin ser kiryarên Komela ji, lê zêdetir emê lî ser PDKî û rewşa Kurdistanana Rojhilat bisekinin.

Dema ku roja 1'ê Sibata sala 1979'an Xûmeyni hate Îranê, wê demê Şah revî bû çû bû. Xûmeyni hate welat û pêra çû Tahranê rûnişt. Seranserê Îranê bîlî Kurdistan bî halla-halla û selewata deng da. Şah dî gel jinên xwe çû Mîsîrê û xwe sparte dewleta Mîsîr. Xûmeyni gelek salên dirêj lî dervayê Îranê nefikîrî ma bû. Xûmeyni, xwe qencê xwedê îlanîkîr, piştî ji jî bona serkwezaretê dewleta Îranê 13'yê meha Sibatê Mehdi Bezîrgan tayîn kir ku hîkûmeta nû deyne. 1'ê Nîsanê ji Cumhûriyeta Îslamî xwe beyan kir. Xûmeyni û hevkarên wî ewil dest bî girtin û kuştina alîgirên Şah kirin. Serkwezîrê Şah Ebas Huweyda hate girtin. Piştî dadîgehek biçûk, wî idam kirin. Xûmeyni ji aliyek ve Şahperestan dîgirt, ji aliyê din ve jî, Emrikahiyan bî gîrew dîgirt. Roja 4'ê Çîriya Paşîn 52 kes jî Emrikahiya bî gîrew (rehin) hatne girtin. Seferatê Dewletên Yekgirtiyên Emrikayî bî destê pastaran<sup>(1)</sup> hatin dagîrkirin. Du roj piştî vê bûyerê Bezîrgan istifa kir û xwe da alî. Lê kiryar û bernama Xûmeyni qet tîk nedîçû. Zêdetir bî hêz dîbû. Lewra 2'yê Çîleyê Paşîn zagona bîngehî ya nû dî hîlbiyartînek giştî de bî pejîrandîna zêdehî (wekî jî sedan nod-90 %) hate qebûl kirin. Hetanî sala 1980'ê, ango dî-salek de, Xûmeyni lî seranserê Ecemîstanê banduriya xwe temam kir.

Dî despêka sala 1980 de roja 26'ê

Çîleyê Paşîn Ebul Hesên Benîsadir bu serkkomarê Komara Îslamî ya Îranê. Dema ku dî sala 1980 roja 22'yê Îlonê de şerê Îran û Iraq despêkîr, hêj jî Benîsadir serkkomar bû. Ev wezîfa wî hetanî 26'ê Hezîrana sala 1981'an dewam kir. Xûmeyni wê rojê Benîsadir jî wezîfê xîst û xain îlan kir. Piştî bî du rojan vê carê Elî Recayî bû serkkomar. Recayî jî, 30'yê meha Tebaxê, bî destê Çîrikên Mîcahîdnên Xelk hate ceza kirin û mir. Piştî Recayî, Elî Xameneyî kete şûna wî. Dî sala 1982 roja 9'ê Nîsanê de wezîrê derveyê kevn Sadîk Kutupzade hate girtin û idam kirin. Roja 1'e Çîriya Pêşîn, lî Tehran teqanek mezin çebû. Dî mîzgefta Tehranê de nêzîkî 80 mirov hatîne kuştin. Vî emelê jî Mîcahîdan hîlanîn ser xwe. 4'ê Gulana sala 1983 hevkar û damêzrênerên dewleta Îran ya nû, partiya Tudeh jî aliyê pastaran ve hate qedexekirin, serkê partiyê Kîya Nûrî hate girtin û piştî wexta bî dîzî hate idamkirin. Îran ketibû nav gelaşiyek mezin. Jî aliyêk ve şerê derve, jî aliyê din ve teror û tekîliheviya hundur, rewşa aborî, sererastkirina siyasî û civakî, pîrsa Kurdan û şerê Kurdistan. Sîrûd û dirûşmên pastaran wê demê; "Bîmri Emrika, Bîmri Sovyet, Bîjî Xûmeyni" bû. Pîrniya Eceman lî dorê van sloganên bîbûn yek û piştî wan bî rêz bûn.

Dema kû Şahê Îranê sax bû, bî dewleta Iraqê re paymanek çêkiribû. Lî gora vê peymanê Şatûl-ereb dîgiyîştê Iraqê. Xûmeyni riayetê tu biryar û peymanên dema Şah nekîr û hemîyan pûç îlanîkîr. Deynê derve neda, peymana bî yek alî xîra kir û piştî jî dewa Şatûl-ereb kir. Lî ser vê yekê dî gel Iraqê kete şer. Şer 8 sal dewam kir. Bî milyonan kes hatîne kuştin. Dî vî şerî de Îran jî aliyê mirovan ve û hêzên reşahîve zexm bû, Iraq jî, jî

(1): Pastar; jî milîsên Xûmeyni re tî gotin.



aliyê hewahi û teknolojik ve zexm bû. Tu kes bî eşqere çek û teqemeni nedîda Îranê. Lê bî dîzi gelek dewleta bî bûhayek erzan nefta Îran dîkırıyan û beramberê neftê çek û teqemeni dîdana Îranê. Aboriya her du dewletan ji militarize bî bû. Êdi her tişt ji bona eniya şer feda dîkırın. Ev şerê dijwar lî dawiyê dîkarın bêjın ku bî serketına Îranê kuta bû. Xûmeyni, jî aliyêk ve dîgot "Bimre Îsrail û Siyonizm", jî aliyê dın ve jî bî dîzi jî Îsrail çekan dîkırı û ticaretê dîkır.

Xûmeyni jî bona ku dî hundurê welatê Iraqê de jî Iraqê bê hêz bîke, piştgiyaya hêzên Iraqê, ê muhalifên Seddam dîkır. Hêzên bî kirê girti saz dîkır, weki Hizbul-dewa. Xûmeyni van rojan dîgot: " Emê dakevîne Basrayê, jî vîr Bexdayê bıgrın, Seddamê kafır bıkûjın, paşi herne Necef û Kerbela tola Hesen û Huseyin bıstinın û pê ra bıgêjın Mescid-ul Aksa, Kûdus, ew bajarê mîqedes jî destê cûhiyan (yahudiyan) derinın û lî Rojhûlata Navin serdariyek islami damezrinin." Ecema jî bî van derewan bawer dîkır, dîgotın, " Xûmeyni Ruhulxwedayê". Xûmeyni bıryar dîda ku "ew kesên dî şerê mûsilmanan de lî dîji kafır şer bîke û şehid bîkeve wê here beheştê." Gelek kesan jî xwe bî van xeyalên xam mujûl dîkır. Jiyanek bî terhê islami û şeriatperweri lî Ecemistanê pêk hatibû. Roja inê hemû rûniştvan mecbûr bûn ku herne nimêjê. Dî dema nimêj kırıne de Îmam Cuma (Melayê Mızgeftê) dîpeyiviya û lî ser şer û dehatiya Îranê wazan dîda. Melayê Mızgeftan dî her hali de serekbajêr û wali jî bûn. Hemû bî serê Xûmeyni sond dîxwarın. Noker û xûlamên Xûmeyni bûn.

Kurdên Îranê, dî şerê Îran û Iraq de mane bê teref. Ewana jî dîxwest kû dî bûyerêk wîha de çend tişt bî dest bıxın. Bî rasti jî PDK-Î, siyasetek payebilind ajot. Lî dîji êrişên hewahi yên rejima Seddam derdîket. Ne dîxwest ku her du welat ji

wêran û xopan bıbın. Lê her du xwinmuj weki gurê har dev avetibûn hev û jî xwinê têr nedibûn. Iraq jî her wekê Îranê dî nav hêzên mîxalifên Îranê de dîxwest tevgerek dijwartır lî dîji Xûmeyni pêk bîne. Arikari û yarmetiya Çirikên Mîcahidên dîkır, ci-û war; xwarın û vexwarın dîda wan. Iraq gelek car nêzikayi lî PDK-Î jî dîkır. Lê PDK-Î weki ku Iraq dîxwest nokeri qebûl nedîkır. Her wîha dî halêk de kû PDK-Î lî dîji hêzên Xûmeyni şer jî dîkır, disan jî bî siyanet û hîmet ber bî armançê ve dîçû. Xûmeyni jî destê xwe jî YNK û PDK-Iraq re dirêj kırıbû. Diyarê Kurdistan dî nava erdek wisan de ye ku çar aliyê wi qefaltne û dijman in. Jî bona pêwendî û çûn û hatına derve, jî bona bî dest xistına yarmetiya dervayi Kurd jî hewceyê deriyêk derva bûn. Yêk deriyek hebû, ew jî deriyê Sovyetistanê bû. Ew deri jî hemiyan qewitır jî Kurdan re girti bû. Kurdê belengaz nedîkariyan dengê xwe bıgêjine tu ciyêk cihanê. Lê lî Kurdistanê Iraqê jî şer hebû. Şerek partizani lî navçê Behdînan PDK-Iraq; lî navçê Soran jî YNK bî tundi şer dîkır. Gelek cara Hêzên Kurdên Iraqê bî taybeti PDK-Iraq, jî PDK-Îranê re hêrs bûye. Ku, çîma alikariya wan nake. Da ku Seddam hılweşe, Kurdên Iraq bextewarbın. Lê her ew gazin jî bo Kurdên Îranê jî meqbûl e. Lewra ew jî lî dîji zordariya Îran jî bona mafê Kurdên Îranê şer dîkır. Bî kurti PDK-Îran û PDK-Iraq dî wi babetê de tu carê lî hev nehatine. Ya rast jî ev e ku her kesek dî şûna xwe da bıxebite û gelê xwe dî beşê xwe de ber bî rızgariyê bıbe. Diyarê piştgiyê û yarmeti pêwîst e. Lê divê rêzek jî jî vê rewşê re peyda bıbe. Weki dî dîlêşî dîxe navbera Kurdan. Carcaran jî dîbe sedemê şerê bırakuji.

(Dûmahik heye)

# Leyla û Mecnûn

K.RONAHÎ

Keçîkek hebû ku navê wê ji Leyla bû. Leyla qîza eşîran bû. Bavê Leyla beg bû û êla bavê wê êlki bî nav û deng bû. Leyla kulilka ber çavan, delala êlê bû. Dîlê her xorti da tirêja rojê, germayîyeke nerm bû. Gulan lî ber wê şerm dîkîr û stuyê xwe xwar dîkîr. Hiv lî ber wê qemer dîma. Bî şev, hiva ku çav bî Leyla dîket xwe lî pişt ewran vedîşart. Gava ku lêvên Leyla bî ava Kaniya Gazîyan dîket, ava wê dîsekîniya.

Û xorteki hebû bî navê Qeys. Xorteki hêja û delal bû. Bejneke zîrav û dirêj pê ra bû. Zana bû, hunermend bû, humermendê dîla bû. Feqî bû. Kûrê pirikê bû, pirikeki feqîr. Yek bî tenê bî xwe û diya wi bû.

Bîhar bû. Bîhareke bî nergîz û sosîn. Her der mêrg û çîmen bû. Dî berbangan da helma tirêja roje vedibû.

Wexta zozana bû. Beg êla xwe rakiribû û bî rê ketibû. Giştin zozana û konên xwe lî Kaniya Rasîlaynê vegirtin. Ew sal pêsîrên zozana tîji bû. Jî xwe tu sal zarokên xwe birçî nehiştî bû. Mina ku kêf dîkîr bî wan konan. Leyla û Qeys pêşiyê, hev û dû lî wê zozanê din. Dî wi zozanê da dîlê wan ket hev û dû.

Evin dî çîrûskên çavan da veşartîye. Evîna wan bî çavan bû. Evin dî dîlan da germayîyeki ye. Dîlê wan bî wi germayîye davêt.

Bî wi destpêkê bûn evîndara hev û dû. Dîlovanîki bî can û rûh bî wan ra çêbû. Dîlê wan bî rojê tîje bû.

Kêfa mezîn, carcaran dîtina yarê û himbezîkirîna yarê ye. Leyla û Qeys jî bo wê

kêfa mezîn bûn.

Qeys hemû tîşt jî diya xwe ra got. Niyeta wi xwestîna Leyla bû. Dema ku gotinên xwestîna Leyla ket navê, diya Qeys cîda rabû. "Leyla qîza beg e. Qet beg qîza xwe dîde merivên feqîr û belengezan. Tu bî xwe baş fikîrî, ya tu din bûyî?"

Lê dîlê Qeys şewtî bû. Diya xwe bo xwestîna Leyla razî kir.

Rojek bû, rojek bî tav. Lê ewr jî hebû û ewrên tîji bûn. Dî wi rojî da bûk û diya Qeys çûbû ser kevîrê sipiyê ku ber konê Beg da bû, runîştibûn.

Konê Beg dî seri da bû. Ber kon kevîrki sipî hebû. Ki, bîbiya xwezgîniya Leyla, dîçû ser wi kevîrê hanê rûdînişt.

Pêşiyê, xûlameki beg wi dit. Ber bî nêz bû û jê ra got: "Zu rabe jî yîr. Vîra cîyê xwezgîniyê Leyla ye. Vîra cîyê beg û eşîran e. Ku tu hati geştê, geştî mala beg pîr e, bîra bîdîn te û rîya xwe ra bîmeşe".

Diya Qeys jî bersiv da "Ez ne feqîrim, ne ji hatîme geştê. Hatîme ku bîbîm xwezgîniyê Leyla".

Beg wi dengê pê dihese û derdîkeve derva. Bang lî pirikê dîke: "Qelenê Leyla hezar deve, qutlî kumaş barê wan, ser bar jî zêr. Jî wi pêştîr heft kerî jî mî. Pey kû te wan tîştan anî, wê çaxê kari ser wi kevîrê hanê rûnî!"

Pîrê radîbe dîçe, tê dîgê mala xwe.

Qeys jê pîrs dîke. "Te çawa kîr dayê, te çû Leyla di?"

Diya Qeys stuyê xwe fetiland û bê dîl hînek gotin ji devê wê derket: "Mîn çû Leyla di. Yeki lêv reşa lêv deqandi ye. Ne layiqi te ye lawo."

Qeys: "Te çima wi sucê hanê Leyla da ani. Xwedê te ji çava korke, ji dest û piya çoqal ke. Te ji xwedê netirsîya kû wi iftirayê hanê di Leyla da ani"

Diya Qeys di wê demi da hişk û çoqali bû. Bû fena gîfşeki û ket aliki.

Bî wi sedemê hanê ku bavê Leyla wi neda bû Qeys, Leyla nexweş ket. Bo nexweşîya Leyla, beg, kêderê feqi û mele û hekim hebû, hemû anin, lê tu yeki ji çarê ki ji nexweşîya Leyla ra nedin. Kêra tu yeki, ji wê ra tune bû.

Leyla roj bî roj dehi ji xerab dibû.

Peyra Qeys pê dihese ku Leyla nexweş ketiye. Ramanek kûr pê ra çê bû. Bî derd û xeman bû êdi.

Bî wi sedemi, rojeki Qeys qurana xwe dîke bîn çengê xwe û radîbe bî rê dîkeve. Tê dîgê ciyê êla bavê Leyla û diçe konê beg da dîsekîne.

Xûlamên beg wi dibînin, didin sekinandin û jê pîrs dikin: "Tê xêr e, tu hati çî?"

Qeys bersiv da; "mîn bîhistiye ku beg gazi feqi û meleyan kîriye. Lê tû yeki wan ji nexweşbûna Leyla ra çareki nedine. Ez ji feqiyeki me. Dîxwazim ayeteki ji ez bîxwinim"

Xûlamên dengê xwe bîlînd kîrin; "Kîro, lawo ewqas şêx û mele û hekim hatin tu çareki nedin. Sêwîyê çeng şewiti, tuyê bîbini? Riya xwe va here".

Lê yek ji wan xûlamên tê pêş û dibê "Gûneye, wi feqiyê hanê berdîn bîra here. Heye ku tîşki bîdîn jê ra"

Qeys berdîdî hündürê kon. Dema ku Qeys kete hundîr, di ku Leyla bêhiş û bêaqil e, mîna xezalek çav kîldayi radîze.

Mîna ku di nav heft xew da be.

Qeys hêdika kursiyê xwe dani ber serê Leyla û dest bî ayeteki kîr. Ew xwendin mejiyê Leyla da eser kîr û çik ki avêt nava dilê wi. Kon bî roj tîje bû. Bîna zozanan ket hundîrê kon. Ayeta Qeys ku ber bî qedandîne bû, Leyla hêdi hêdi dest pî lîvîrandîne kîr.

Peyra ku Qeys ayet qedand, zukava radîbe diçe ku Leyla wi nebîne. Qeys ku bî rê ketîbû, Leyla ji ciyê xwe vecîniqî û bazda ser xwe. Deng bî dora xwe kîr, gazi xûlamên kîr. "Ew helbestvan û xwendevane ku gava dinê wi ayetê hanê xwend, çû ku?"

Dîbên çûye ber bî ali kaniyê va. Leyla ji radîbe û pêy dîkeve dere ali kaniyê va.

Dî wi demi da xeberê didîn beg, ku Leyla êdi baş bûye. Ew çax ji êdi paşîya zozana bû. Beg bang lî eşîra xwe kîr" Zû, bî lez, êl bîra hemû rabe, emê barkîr"

De em wana lî wê bîhêlîn, disa vegerîn ali Leyla û Qeys. Leyla lî ser kaniyê tê dîgê Qeys. Dema ku hev û dû din, çîrûskê avêt çavê wan. Dilê wan ji mîna perê çîvîka davêt. Demek baş tenê çavê hev û dû nîhêrt in. Her der ji wan ra bûbû mîrg û çîmen. Av ki zîrav hûrîk hûrîk dîhat.

Destê hev û dû gîrtin. Dîlgermî û bî dîlxweşî bûn. Dî şabûnek mezîn da bûn. Evîna wan bédeng bû, bes tenê bî çavan bû.

Rûniştin, Qeys bî wê dîlgermîyê serê xwe dani ser çoka Leyla û bî wê sîvîkbûnê, cîda ji çû xew. Leyla mîna xezalek bédeng bû, lî Qeys dinêrt û bî porê wi dilist.

Dî wê demê da eşîr koça xwe barkîrî bû û bî rê ketîbûn. Yek ji nav eşîrê bazda ser kaniyê û deng bî Leyla kîr; "Leyla, rabe, koç barkîr, tu tenê mayî şûna waran da"

Leyla pêşa kîrasê xwe jêkîr, hêdika Qeys ji çoka xwe helani û wi perçe ji dani binê serê Qeys, dûra ji morîya xwe avêt goyê Qeys û rabû bazda gîşt koça xwe.

Koç ber bî beriyê va rêket. Gîştin

gundê xwe û barên xwe danin.

Lê Leyla ji Qeysa xwe qetiyabû. Evin salki salawext di dilê Leyla da ma. Ew evin mina tové hesretê bû, bi gûmrehi hêşin dibû roj bî roj. Leyla, ki dîhat, ki dîçû; ji rêviya, ji teyra û turûta her gav pîrsa Qeys dîkîr. Lê tu yeki wan Leyla ra xeber ki ji Qeys nanin.

Rojeki teyre ki kur û qert ji wi ali da xwe dîkûta û dîhat. Leyla ji wi ji pîrs kîr. "Ji rê ki dûrva têy tu, te germiki xîst dilê min. Te Qeysa min qe li wan dera nedi?"

Teyr bersiv da: "Do wan çaxa ser kaniya Resilayné derbas dibûm. Termêk li erdê dirêjkîri bû. Mar û mîşka ser wi hêlin çêkiribû. Min fehm nekîr ku yan miriye yan ji bi rûh e"

Leyla çavki bi hêşîr, dilki bi teng berê xwe da ali çîyan û bi xwe şewîri: "Min pîrsa xwe ji teyrê kûr kîr, Keziya xwe ber da kûr kîr"

Paşî wi bûyerê, Leyla disa xwe li nexweşbûnê dani. Roj bi roj dîheliya. Tu kesek û tu tiştek jê ra baş nedîhat. Bi tu keseki ra xeber ji nedîda. Lê ji bavê xwe ra dîgot: "Tenê ser wi kaniyê baş dibim".

Wexta zozana ji hatibû. Beg koç û êla xwe rakîr û bi rêket in. Disa dîçûn ser Kaniya Rasilayné.

Bayeki hênîk ji çîyan dîhat. Li çîyayan hêja ji berf hebû. Koça xwe danin. Dawar û pezê xwe dîçêrand in, ku ew bi koç û darandînevê mujûlbin. Leyla bê sekîn ber bi ali kaniyê va bazda û gişt ba Qeys. Sal zivîri bû, bi bû bihar, Qeys sal ki salawext di xêw da mabû.

Dema ku Leyla gişt ba Qeys, dit ku Qeys hêja ji razandîye. Leyla destê xwe avêt û guharê xwe ji goyê Qeys derxîst. Gava Qeys çavê xwe vekîr zukava bazda ser xwe. Xwe li tozê hin pêvaye dawşand û aliki da ji bi çavki ronak, ku çîrûsk pê dîket, li Leyla dînêrt.

Lêvê Qeys dest bi lîvilandinê kîr: "Feqi

û melleyê ku li mala bavê te bûn hêja li wê ne, yana bela bûne?"

Leyla deng ki hurîk bersiva Qeys da: "Mala bavê te ava be. Çi feqiye çî meleye. Sal çûye, zivîriye dora salê, em çûne binê beriyê û em cardin hatine zozana".

Mijûlayiki kûr bi hev ra danin. Kêf û eşqa xwe kîrin. Jin, ji wan ra mina baskê çivîkê bû. Usa sıvîk, usa nerm, usa ji germ.

Fesat ki melanet wan li wê de rê dibîne û xeberê tê dîginê beg. Dîbê: "Wa Leyla û Qeys ser kaniyê ne û kêf û eşqa xwe dîkîn. Leyla isal, bona kêf û eşqa xwe êlê aniye vîra. Bawer naki here binêre".

Beg bazdaneki ber bi ali kaniyê va çû. Dema ku gişt wê de rê Leyla û Qeys bi hev hembêzkîri dit.

Bayê çîyayan dîhat. Ewra, tav veşartibû. Ewr tîji bû û ber baranê bûn.

Leyla û Qeys pîri ku ji xwe fedî dîkîn, dest bi lavayiyê dîkîn: "Ya xwedê me bîke du heb stêrk û bide ber perê esmana".

Her du ji cîda bûn du heb stêrka titalok û giştin ber perê esmana.

Ji wi rojî şûnda her sal salê careki wexta zozana ev her du stêrk hêdi hêdi dîgên hev û dû, dema kulinav bîkevîn disa ji hev û dû dîqetîn, dûr dîkevîn. Stêrka Leyla dîçe ali beriyê, a Qeys ji dîmine li zozana. Dîbên kingê ew her dû stêrk hatin ber hev û dû û cîda ji ji hev qetîyan, ki viya bibîne û mîrad bîke, wi mîradê wi dîçe seri.

Ji wê rojê şûnda navê Qeys bi Mecnûn hat gilîkîrîn. ■

**Ezgi Prodüksiyon**

*Dizgicilikte yeni çığır...*

**TLF: (831) 455 78**

**Diyarbakır**

Azad, Dilan, Bêrivan  
 Jı Agiri hetani Piran  
 Amed, Hewlêr, Mahabad  
 Bûn paytextê Kurdistan

\*\*\*

Bejna Heso bilind e  
 Takrihana nav gund e  
 Keçik çûne ber avê  
 Çavê Heso ya rind e

\*\*\*

Diçime geliyê asê  
 Çilo diçinim bı dasê  
 Geli lawika lez bıkın  
 Keçika rakın reqasê

\*\*\*

Ez çûme mala metê  
 Dani ber me goştê betê  
 Para axa êş ketê  
 Para metê mêş ketê

\*\*\*

Fesadê haqa-maqa  
 Revi kete nav fıraqa  
 Fıraç tev ketin erdê  
 Pirê da ber şimaqa

\*\*\*

Kalek ji kalê bızina  
 Bızın berda kızina  
 Nıkare ji erdê rabe  
 Kalê mêrê du jina

\*\*\*

Keftarê hizi-mızı  
 Ber tendûrê qelızı  
 Jı birçına xwe va çû  
 Nan nedit, kûtek dızı

Keçikê xırab malê  
 Lawa ra meçe pişt palê  
 Lawik tev din û har in  
 Tu bı silameti nayê malê

\*\*\*

Lawikê mın Keleş e  
 Zebeşa dendik reş e  
 Hat xwezgini mın nedanê  
 Jı kerba mın nexweş e

\*\*\*

Mala kurik lı rastê ye  
 Mêrxas e kurek çê ye  
 Talan ani ji Qersê ye  
 Kılê çavê Besê ye

\*\*\*

Pira keftar hıç-hızı  
 Ber kulinê qelızı  
 Kebaniyê pişt xwe dayê  
 Nanek ji teştê dızı

\*\*\*

Qemerê çıl kezinê  
 Bedewê weke Zinê  
 Lawik hemû bezinê  
 Revi kete kulinê

\*\*\*

Rıhanê dêre zerê  
 Çavbelekê qemerê  
 Xwe da binê sıvderê  
 Lawika şer kır lı serê

Sipano koloz gewro  
 Mexelê pezê stewro  
 Lı ser seri berfa sar  
 Lê diçêre berx û kar

Arif SEVİNÇ:

**" Gözlerimi fırça, beynimi tual olarak kullandım. "**

**GOVEND: Arif Sevinç kimdir ? Resim çalışmalarına olan ilginiz nasıl başladı ve hangi süreçlerden, hangi faktörlerin etkisi altında bugüne geldiniz? Birazda çalışmalarınız hakkında bilgi verirsiniz?**

**A. SEVİNÇ:** 1959 yılında Ağrı'nın Doğubayazıt ilçesinde doğdum. Emekçi bir aileden geliyorum. Ailem alabildiğine yoksuldu. Herşeye rağmen okumaya, eğitimimi tamamlamaya çalışırken, lise yıllarımdan başlayarak felsefeyle ve politikayla ilgilenmeye başladım. Bu döneme rastlayan resim çalışmalarım, bir boş zamanları değerlendirme uğraşığıydı. Ancak kendimi, toplumu ve evreni kavradıkça, insanı kendine ve topluma yabancılaştıran eğitim sistemi ve düzenden koptum. Emekten yana, halkımdan yana fırçamı kullanmaya başladım.

Diyarbakır 5 Nolu Askeri Cezaevinde kaldığım 4.5 sene boyunca, işkence ve insanlık dışı uygulamalarıyla devletin Kürt halkına yaklaşımına yakından tanık oldum. Bu yıllar sanat anlayışımın hızla yeniden biçimlenmesine ve bilinçlenme süresine yeni bin ivme kazandırdı. Böylece sanatın bir silah olduğu gerçeğine ulaştım. Picasso'nun dediği gibi, resmin evlerin duvarlarını ve binaları

süslemek için yapılma yacağını, fırçanın düşmana karşı bir savunma ve saldırı silahı olduğunu anladım. Cezaevi koşullarında re-



sim yapmam mümkün değildi. Ben de gözlerimi fırça, beynimi tual olarak kullandım. Cezaevinden çıktıktan sonra beynimdeki tualleri gerçek tuallere dönüştürdüm. İlk kişisel sergimi Ankara Mülkiyeler Birliği'nde, "Haberin Var mı Taş Duvar?" adı altında açtım. Daha sonra Adana ve İzmir'de benzer içerikli sergilerimi açtım. Çalışmalarım aynı hızla devam ediyor ve edecek.

**GOVEND: Sanat anlayışınızı kısaca öğrenebilir miyiz? Ayrıca sanatı politikadan soyutlayan eğilimler hakkında ne düşünüyor sunuz?**

**A. SEVİNÇ:** Toplumda kıran kırana süren mücadele, politikadan ekonomiye, kültürden sanata, her alanda boyutlanırken sanatçı bu mücadelede tarafını belirlemek ve sorumluluklarını yüklenmek durumundadır. Sanat, aynı zamanda resim, bir eylemdir. Ekserisini

politik mücadeleye dayandırmayan hiç bir mücadele anlamlı bir sonuca ulaşmayacaktır. Sanatı politikadan ayırmak yaşamdan koparmakla eş anlamlıdır. Böylece sanatçı kendi özüne yabancılaşarak, mevcut sınıfsal ve bireysel ilişkileri onaylar bir konuma düşer. Sonuçta

sanatsal obje ile sanatsal suje arasındaki bağ daralır ve Şarlo'nun şiddetle karşı çıktığı düzenin meşru dişlileri haline gelir. Oysa sanatçı halkına seslenmeli ve halkını eğitmek gibi gönüllü bir görevi üstlenmelidir. Köklerini toplumsal ilişkilerden alan ve yine bu ilişkileri yansıtan sanat gerçeğe dayanmadığı sürece topluma ve insana seslenemez. Peki gerçeğe nasıl ulaşılır? Bunun

yanıtını ünlü ressam Gary Rickson'da bulabiliriz: "Siyasetle uğraşmazsak gerçeğin içine yerleşmeyiz." Demek ki sanatın özü gerçek, gerçeğin özü ise siyasettir.

**GOVEND: Günümüz Kürt resim sanatının düzeyi ile ilgili neler söyleyebilirsiniz? Sizin bu alanda-**

**ki yeriniz ve tekniğiniz nedir?**

**A.SEVİNÇ:** Yakın dönemimizde Kürt halkı uluslaşmak sürecini daha hızlı ve kapsamlı yaşıyor. Kürt halkının Ulusal-Demokratik mücadelesinin ulaştığı boyut, aynı zamanda Kürt sanatını ve Kürt sanatçısını da

şekillendirmektedir. Artık Kürt sanatçısı kendi kimliğiyle cesurca ortaya çıkarak Ahmedé Xani'ler, Meleyé Cızırı'lerle bağ kurmaktadır.


Bunu edebiyatta ve müzikte gördüğümüz gibi, resimde de görmekteyiz.

Geçmişte pek çok Kürt ressam yaşamıştır ve bunlar pek çok eser meydana getirmişlerdir. Bu ressamlar kendi ulusal kimlikleriyle ortaya çıkamadıklarından ürün-

lerini de Kürt resim sanatına dahil edemiyoruz. Bu günümüzde de kısmen geçerlidir.

Kürt resminin miladı, Kürt devriminin Ulusal Demokratik mücadelesinin içinde filizleniyor. Kürt halkının zulme, sömürüye karşı başkaldırısı bir ifade biçimi olarak diğer sa-





Resim, yalnızca yeteneği değil, bilgiyi de zorunlu kılıyor. Geçmişin siyasal ve toplumsal olgularının yanısıra buna paralel olarak sanat olaylarını ve sanatçıların da tanımak bi-

natlarla beraber Kürt resmini de yaratıyor ve giderek kurumlaştırıyor.

Ben bir Kürt ressamı olarak, halkımın yarattığı binlerce yıllık birikimi kalıplardan ve önyargılardan kurtularak, her sanat akımının ve her sanatsal yaratının ortaya koyduğu plastik buluşları çekinmeden kullanarak, her biçimi deneyerek halkıma seslenmeyi, onu pedagojik bir işleyle sınırlamadan eğiterek, özgürlük coşkusu ve özgürlük özlemini estetik bir görsellikle yansıtmayı hedefliyorum.

**GOVEND:** *Resim sanatında da bir çok akımın olduğunu biliyoruz. Bu akımlardan etkilendikleriniz var mı? Bu konuda neler söyleye bilirsiniz?*

**A.SEVİNÇ:** Sanat hiç kuşkusuz bir etkilenme sürecini de beraberinde getiriyor. Resim alanında kendini kanıtlamış usta ressamlardan etkilenmemek kuşkusuz mümkün değil.

linçlenme sürecinin bir parçasını oluşturuyor. En azından sanatçının ürettiğini tanıması, verilerini bilmesi ve değerlendirebilmesi için önemli bir araçtır. Bir Courbet'ten Daumier'den Orosco, Rivera, Siqueiros, Portinari, Matta ve Manet'ten etkilenmemek, güzel şeyler bulmamak mümkün değil. Yaşadıkları çağın ve toplumun çelişkilerini değişik biçim ve anlayışlarla anlatıp, daha güzel bir gelecek için ip uçları vermiş bu resim ustalarını elbette hiç bir ressam elinin tersiyle bir kenara itemez. Oturup tarih kitaplarından öğreneceğimiz bir çok gerçeği Courbet'in bir kurşuna dizilme deseninden ya da Manet'in bir iç savaş çalışmasından anlayabiliriz. Yada modern Meksika resim sanatı Muralismo (Duvarcılık), İspanyol işgalinden iktidarın Peonlar'a uyguladığı baskıların açığa vurulmasına kadar bütün Meksika tarihini, eleştirel biçimde binlerce



duvar üzerinde açıklamıştır. Aynı şey Şili'de, Allende döneminde olmuş. Duvarlar Unidad Popular siyasetini desteklemek için yapılmış resimlerle doludur. Yine Şili'de Ramona Parra Tuğayları, A.B.D' nde Zenci Ghetto-ların duvar resimleride bilinçli ve örgütlü sanatın (resmin) en güzel örnekleridir. Tüm bu tarihi ve sanatsal olgulardan etkilenmemek, estetik, öz-anlam kaygısında izlerini görmemek mümkün değil.

#### GOVEND:

**Kürt resim çalışanlarının içinde bulunduğu güçlükler nelerdir? Bunları aşmak için neler yapılabilir?**

#### A.SEVİNÇ

: Kürt resmi tarihsel ve toplumsal koşul-

larda ki bazı olumsuzluklardan ötürü yeterince gelişmemiştir. Bunda en büyük etken Kürt halkının özgür olmaması ve sürekli baskı ve sindirme politikalarının dayatılması ile din olgusudur. Dinin getirdiği yoğun kısıtlamalar ve özgür olmayan bir Kültür-Sanat ortamı Kürt resim sanatının gelişimini sürekli olarak durdurmaya çalışmıştır. Kürt ressamı, bir Fransız ressamından yada bir İngiliz ressamından çok daha farklı koşullarda sanat yapar. Kürt ressamı herşeyden önce kendi kimliğiyle ortaya çıkma ce-

saretini ve bunun sonuçlarını göze almak zorundadır, ki bu onun en doğal hakkıdır; ikinci olarak Kürdistan'da devletin yoğun baskıları Kürt resmi için başlı başına bir engeldir. Bilindiği gibi resimlerde sarı- kırmızı- yeşil renklerin kullanıldığı tablolara yasaklar konulan bir ülkede yaşıyoruz. Üçüncü olarak kendini halkına karşı sorumlu hisseden her Kürt sanatçısı, ayrıca bireysel olarak bazı zorluklarla da karşılaşılıyor. Bu koşullar altında Kürt

resminin özgürce gelişebileceğini söyleyebilir miyiz? Elbette hayır. Sanatın meta haline dönüştüğü, resim piyahasından bile söz edilemediği bir ülkede Kürt ressamı halkına gidebilmek için



tüm yolları ve imkanları kullanmak zorundadır. Galerilerden tutunda broşürler, kartpostallar ve gerekirse seyyar sergilerle Kürt halkına ulaşmak zorundayız. Kısacası ressamına büyük zorluklar düşüyor. Bu da onun mücadelesindeki alın yazısı... ■

# Kelime û Bêjeyên Diji Hev

VAZGAL

Lı vıra dı kurdi da kelime û bêjeyên ku diji hev in natine nivisandinê. Helbet ew xebateki dûr û dirêj nine, dibe ku rêyeki nişanê lêkolinvanên Kurdan yên nû gihîştî bîke, bala wana bikişê şer van karan.

<b>A</b> badin	:Kavıl, kambax
Agah	:Bêxeber
Agır	:Av
Aligır	:Xalixerez
Ap	:Xal
Av	:Agır
Ava	:Xırabe, wêran
Axa	:Xulam
Aştı	:Şer
Aza	:Dil, kole
Azep	:Zewıcı, şükiri (Bo jınan)

<b>B</b> ajar	:Gund
Bakûr	:Başûr
Baqıl	:Din, şet
Bawer	:Şık
Bera	:Vir
Beran	:Mi
Berê	:Piştê, paşê
Bereket	:Xela
Berjêr	:Berjor
Beroj	:Nizar-Si
Berpêş	:Berpaş:
Berwar	:Bınatar
Bêter	:Sêfil, belengaz
Bextewar	:Bedbext
Bıra	:Xwişk
Bırazi	:Bıraza
Bûha	:Erzan
Bûk	:Berbûk
Bûk	:Zava
Bûra	:Dış (Baldûz)
Bihûşt	:Dojeh
Bırçi	:Têr
Bıkar	:Betal

<b>C</b> ahıl	:Ronak, rewşen
Camêr	:Canık
Carna	:Hertım, daim
Ceh	:Genım
Cınet	:Cehenem
Comêrd	:Tıma, çıkus, pıntı
Cûda	:Wek, mina, nola, nota

<b>Ç</b> ep	:Rast
Çetın	:Sanahi, hêsan

Çewt	:Rast
Çiya	:Deşt, beri

<b>D</b> adi	:Bêdadi
Deşt	:Zozan
Dê	:Bav
Dêm	:Avi
Dewlemend	:Feqir, xızan
Dik	:Mirişk
Djwar	:Hêsan
Dılovan	:Dılgırs
Dılsoz	:Dılreş
Dılgerm	:Dılsar
Dınya	:Axret
Dirêji	:Berayi
Dirêj	:Kurt
Dızı	:Eşqere, eyan
Dûrbın	:Tengnezer, kurtbin

<b>E</b> rd	:Ezman
Erê	:Na
Esker	:Sivil
Ev	:Ew
Eware	:Kardar

<b>F</b> ayde	:Zırar
Fer	:Zo
Fireh	:Teng

<b>G</b> a	:Çêlek, mange
Gêj	:Serwaxt
Genım	:Ceh
Germ	:Sar
Gur	:Dêlegur
Gılover	:Çargoşe
Gırti	:Azad

<b>H</b> esp	:Mehin
Heval	:Xerib
Hok	:Girê
Hundır	:Der
Hındık	:Zêde, zef, zor, pır
Hışk	:Nerm
Hışk	:Sıst
Hosta	:Ecemi
Hurmız	:Ehriman

<b>J</b> êr	:Jor
Jîr	:Eware, tîral
Jin	:Mêr
Jan	:Qelew
<b>K</b> ar	:Zîrar, zîyan
Kedi	:Kûvi, hov
Kedxwar	:Zehmetkêş, xebatkar
Kêm	:Pîr
Ken	:Mirûz, pozzin
Ker	:Manker
Kêrhati	:Badîlhewa
Kevn	:Nû, teze
Koçer	:Dimati, bîneci
Kuçîk	:Dêlik
Kûr	:Keç
Kûr	:Tenîk
Kût	:Saxlem
Kît	:Cot
<b>L</b> ez	:Hêdi
Law	:Qîz, keç
Lawaz	:Kok, qelew
<b>M</b> alxo	:Bermali, kebani
Maqûl	:Zîrtek
Mê	:Nêr
Medeni	:Har, wahş
Mêrxas	:Newêrek
Mezin	:Pîçûk
Mîri	:Zîndi, sax
<b>N</b> as	:Biyani, xerib
Navser	:Dilgerm, ecemi
Nexweş	:Can, serxwe
Nêri	:Bîzîn
Nêzik	:Dûr
Nişiv	:Hevraz
Nûjen	:Kevnare
Nîşkêva	:Hêdîka
Nîzîm	:Bîlînd
<b>P</b> aqj	:Qîrêj
Paşgotîn	:Pêşgotîn, destpêk
Paşîn	:Pêşîn, ewl
Pêş	:Paş
Peyay	:Siyar
Pêşi	:Paşi
Pêşverû	:Paşverû
Pîrs	:Bersiv, cab
<b>Q</b> edexe	:Serbest
Qelebalîx	:Aram, bêdengi
Qelew	:Jar

Qewi :Qels

**R**ast :Şaş  
Rojhilat :Rojawa  
Ronahi :Tari  
Rînd :Bed  
Rûken :Rûtirş

**S**e :Dêlese  
Ser :Pê  
Serdest :Bîndest  
Serhişk :Sernerm  
Serşkêş :Xweşkeş  
Spi :Reş  
Sîpehi :Kîrêr  
Sîst-Qels :Çalak  
Sîvîk :Gîran

**T**ahl :Şîrin  
Temam-Tewa :Kêm  
Tenê :Hevra, tev  
Tenîk :Stûr  
Ter :Şîl  
Tîji :Vala

**Ş**aş :Rast  
Şev :Roj  
Şeytani :Rehmani  
Şîn-Tazi :Sayi  
Şîl :Zûha, zuwa  
Şîrin :Tahl

**W**ekîri :Gîrti

**X**al :Ap  
Xal :Xarzi  
Xas :Xam  
Xerib :Xumal  
Xwendi :Cahl  
Xwişk :Bîra  
Xîrab :Baş

**Z**alîm :Bîrehm  
Zana :Cahl  
Zehmet :Hêsan, sehl  
Zelal :Şêlû  
Zozan :Deşt, germiyan  
Zîrav :Stûr  
Zîrbav :Damari  
Zû :Dereng

# Kürt ve Ermeni Edebi İlişkileri

(2)

Kinyazê İBRAHİM

Kürt halkının yakın dostu ve Kürt edebiyatına devamlı olarak büyük ilgi gösteren Avetik İshakyan'ın (1875-1957) yaratıcılığı, Kürt-Ermeni edebi ilişkileri tarihinde ilginç bir dönemi oluşturur.

A. İshakyan Kürt folklorunu tutkulu bir şekilde sevmiştir. Bunu şöyle dile getirmiştir: "...Çocukluk yıllarımdan bu güne kadar destanlarını ve diğer Kürt folklor örneklerini sevdim. Bu sevgim ve ilgim giderek arttı ve kuvvet buldu."

Bu büyük Ermeni sanatkarının, Kürtlerin yaşamlarına ait birçok eseri vardır. 1907 yılında "Kürd Amo" hikayesini yazmıştır. Bundan önce (1905) yazdığı "Hesen Ağa" hikayesinde olduğu gibi "Kürd Amo'da da yazarın, eserine kahraman olarak bir Kürdü seçmesi rastlantı değildir. Her iki hikayede de Kürt karakterinin üstün yanları üzerinde duran A. İshakyan, aynı zamanda, iki halk arasındaki dostluk duygularının anlatımına da geniş yer vermiştir. Bu öykülerde yazar kendisinin tanık olduğu, gerçek olayları kaleme almıştır.

Ermeni usta Karo ile Kürt çobanlarının dünyalarından söz eden "Üsta Karo" romanı da ilginç eserlerdendir. Kürt çobanlarının iç dünyası ve psikolojisi bu eserde çok gerçekçi ve inandırıcı bir biçimde ele alınmıştır. Burada Kürt folklorundan da yararlanılmıştır. Bu da kendisinin Kürt sözlü edebiyatı hakkında ne denli derin bilgilere sahip olduğunu göstermektedir.

Yüzyılımızın başlarında Kürt folkloruna bazı yazar, şair ve Ermeni edebiyatçıları büyük ilgi göstererek topladıkları örnekleri yayınlamak üzere değerli katkılarda bulundular. C. Haykûni ve G. Xalatıyantsın "Ermeni-Kürd Şiiri" adlı eseri, C. A. Yeğiazarov'un Kürtler hakkındaki araştırmaları ve İşyanın (Lazo) topladıkları folklor örnekleri butür çalışmalardandır.

Ermeni-Kürt edebi ve sosyal ilişkilerinin yeni bir aşaması da Sovyetler dönemidir. Bu dönemde Kürt ko-

nusu Ermeni Sovyet edebiyatında daha geniş boyutlara kavuşmuştur. Ermeni Sovyet edebiyatının yüzlerce değerli örneklerinde aynı zamanda Kürtlerin yeni yaşamlarının anlatımına da rastlamaktayız.

Ermenistan'da Sovyet iktidarının başarısı, Kürt ve Ermeni halklarının geleneksel tarihi dostluklarını daha da güçlendirdi. Yeri gelmişken anımsatalım, bu başarının kazanılmasında Kürt halkının ve onun kahraman evlatlarının hizmeti az olmamıştır. Sovyet iktidarı kurulduğu günden beri Ermeni ve Kürt halklarının karşılıklı uyumu, edebi-sosyal ilişkileri de yeni bir biçimde amaçlandı.

Ermeni Sovyet edebiyatında Kürt konusunda eserler veren ilk yazarlardan birisi de Aksel Bakunts'dır (1899-1937). 1925 yılında bu konuda "Eyaletten Mektuplar" ve "Kentten Mektuplar" adlı hikayeleri yayınlanmıştır. Özellikle, "Zengezür Yaylalarında", "Saralı" ve "Müro'nun Dedikleri" hikayelerinde dağlarda göçebe bir yaşam sürdüren Kürtlerin yaşayışlarına değinen ilginç ve canlı bölümler vardır.

A. Bakuntsun Kürt konusunda yazdığı eserlere büyük önem veren tanınmış Ermeni Sovyet şairi Yeğişe Çarents'in şöyle bir belirlemesi vardır: "Aksel Kürt emekçilerinin yaşamından söz eden birçok değerli eserler yazmıştır. Hatta, bu eserler bizim Kürt okullarında okutulmaktadır. Aksel'in Kürtleri konu alan hikayeleri ulusal bir ruha sahiptir ve gerçek ulusal çevrenin üstün sanatsal yansımasıdır."

Ermeni sovyet edebiyatında yeni Kürt kişiliği ve Kürt tipi başarıyla yaratılmıştır. Eserlerinde ilk kolhozcu Kürt tipini yaratan yazar-şair H. Zaryan olmuştur, (1900-1969). "Rüşan sıldırım" şiirinin kahramanı Novruz, yeni yaşamın ilk emekçi köy tiplerinden biri olarak dikkat çekicidir.

Uzun yılları dağlarda Ermeni ve Kürt çobanlarının arasında geçen şair Sarmenin (1901-1983), Kürtlerin

ekonomik yaşamlarını yakından tanıyan yazar Vaxtang Ananyan'ın şiir ve öyküleri de (Bir Çocuğun Tarihi, Kaplan Deresinin Esirleri, Pelenk Kayasında) Ermeni Sovyet edebiyatının değerli örnekleridir.

Ermeni Sovyet edebiyatının birçok eserlerinde Kürt kadınının acıları ve sıkıntıları, yeni yaşam biçimine uyum çabaları ve yeni insan olarak şekillenmesi anlatılmıştır. Buyöndeki çabaların Ermeni Sovyet sinema ve tiyatrosu alanında da etkisini göstermiş olması ilginçtir. Örneğin, büyük sinema rejistrü Hamo Bek-Nazarov 1926 yılında Kürt kadınının yaşamını konu alan "Zarê" adlı filmi yapmıştır.

Dikkat çeken bir nokta da Kürt kadını konusunu Ermeni Sovyet edebiyatının bütün türlerinde görüyor olmamızdır.

Düzyazı alanında Hamayak Sirasin "Esmer", Gareki Besin "Malé", Mıgırdıç Armenin "Zübeyde", Mıgırdıç Sarkisyanın "Kürt Kızı", Hraçya Koçarın "Xecê", Stepan Zoryanın "Xezal" adlı uzun ve kısa öyküleri özellikle dikkate değerdirler. Doğal olarak, bu yazarların Kürt konusunda yazdıkları tüm eserleri incelemek güçtür. "Xecê" ve "Xezal" eserlerinin ilginç olan bazı özelliklerini göstermekle yetineceğiz.

